jî em çiqasî bêjim em fedakar in ji bo çand û wêjeya xwe qet jî em nagihin bejna Mîrê Zimanê Kurdî Mîr Celadet Bedirxan jiber ew î hemû samanê xwe li ser ziman û çand û rojnamegeriya Kurdî xerc kir. Û bi saya serê Mîr û gelek hevalê wî di wî heyamî de niha ewqas nivîskarê me çêbûne, ewqas berhem hatine çapkirin, û wê hîn û hîn rewşa çand û wêjeya .Kurdî bipêş ve herê

Helbestvanên Min Helbest Dan wan..

Helbestvan kesekî dil nazik û hestiyar e, çimkî ew êşa di hinavê xwe de derdixe, qet jî jixwe re nabêjê wê navê vê helbestê derkeve yan na..!? Wek dema min Helbesta "Hebis û Zindan" nivîsî, wek min gotî ez di zindanê de bûm rojan hatibûm êşkencekirin, 22 qet jî min bawer nedikir ku wê ev helbest navê wê derkeve, û wê li ser lêva her kesî be, lê birastî jî dema ku hunermend dihatin rex min û digotin ka helbesta bide me, kêfa min dihat û min didan her kesî. Li ser babetê hunermendan an li gunekî mewan 1917 ez di sla bûm şebuhêreka we xweş bû, min di xortek hat û li ûdê xist û stran gotin dilê min arand bi dengê xwe û bi ûda xwe, min jê pirsî xorto tu kî ye? Got navê min Mehmûd Ezîz e, ez ji Dirbêsiyê me, min jê re got were Serêkaniyê ez ê helbestan bidim te, demek neçû 7 hat em li hev civiyân û min helbest dan Mehmûd Ezîz Şakir ew jî ev bûn: **Hebis û zindan, Were were, Gulzerê, Eman Dilo, Şêrîn tu Çinara min î.** Êdî ew çû Libnanê û bi Se'îd Yûsif û Mihemê Şêxo re Komek çêkirin, û pir karê xweşik kirin. Wê çaxê min Mihemed Şêxo nas nedikir, an xortek tev Bizqa 1917 heta sala xwe hat bû mewanê min, gote min ez Mihemed Şêxo me, nû hate bîra min ku ew hevalê Mehmûd Ezîz û Se'îd Yûsif e, min çend helbest danê, gote min ez diçim Kurdistanê tevli şoreşê dibim, divê ez van helbestê te bikim stran, kêfa min hat ji hêza wî re, Mihemed Şêxo çû Kurdistanê û navê wî derket û ewqas stranê an de 1917 xweş digotin di sala hat vegeriya û bû mewanê min, got min tu jiber nekiryê, û hatime helbestan, min jê re got mane tu ji Kurdistanê hatiye û tu ji min re dibêji ka helbestan? Gote min: Rast e, lê ji helbestên te hez dikim. Min ev helbest dane Mihemed Şêxo: **Hebs û zindan, ez bûm ferar, şêrîn tu çinara min î, rabe ji xewê, yarê şekir. Pismamo, şeva tarî, Dayê (ez jî bi cî bim).** Dayka dilovan, eman eman , Çibkim bi can, derdan çî ez dil jar kirim, Koçê mi bar kir, welat welat, gulizar, eman dilo. Perwîn (gotin: Rêncber-awaz:Bêbuhar). **Kûba û Vêtnam** Êdî Hunermend Se'îd Gabarî jî

derket û min helbest dan wî jî ew jî ev bûn: **Koçê me bar kir, hat xweş buhar. Bê bext felek. Di tarî da.** Û min helbest dane hunermend Zubêr Salih û Hesen .Salih

Dema helbest dibe stran tama wê xweş dibe, bi merov re diaxive, çimkî min gelek helbest bi awaz kirine, û wek min got min karê siyasê dikir lewma min nedikarî bibim hunermend, lê ku tenê dimam min kela dilê xwe bi tembûrê dişkand û min qîr dikir .stranan

Di jiyana xwe de min gelek nivîsandin kiriye, û pirtûkên min :ên hatine çap kirin ev in 1988/ Zindan helbest - 1997/ Bang hebest - 2002/ Raperîn helbest - 2007/Serxwebûn helbest - Pêşketin ji weşanên semaKurd - 2008

Helbestvan Bêbuhar di li bajarê Serêkaniyê 10.1.2009 ..çû ser dilovaniya Xwedê

Hebs û Zindan

Hebis û zêndan kûr û tarî xewa min nayê
Ji eşq û evîna gulê ketim belayê
Gula mi vebî bîn da li serê çiyayê
Min got gula min wer vir gul bê dem nayê
...

Gula min rengîn e gula min geş e
Gula min bi xelkê teil e bi min pir xweş e
Dunya li ser min rone dem li min reşe
Dest ji gulê bernadim ku xwîn bimeşe
...

Gula min keske û sor gula min zer e
Hebis û zindan da rizyam gul bê xeber e
Gula min blindest e kul û keser e
Dest ji gulê bernadim can bidim ser e
...

Hebis û zindan kûr û tarî tê da dinalim
Ji eşq û evîna gulê gelek bêhal im
Gula min blindest e pir dem û sal in
Kî gulê bistîne bi xwîn vêra heval im
...

Gula min tu xeyidî min guneh çî kir
Te ji min ra çî got min bi can û dil kir
Min mal û can da ser gelek hindik kir
Riya min gelek dûr bû va eşqê kin kir
...

Carek din jî Rojnameya Bûyerpress spasiya mamoste Rîdwan M.Emin dike, ji bo van belgeyên nêşandî. Valekirina deng û nivîsandin Rojnameya Bûyerpress **Mafê Çapê parastîye..**



AQILÊ SIVIK BARÊ GIRAN E
Serî kevîr û hesin Her dibêje şêxê min
Lê ew nayê bîra şêx Rabe serî bipelêx
Carna dibêje Sovyat Di hawara me de hat
Haya Sovyat jê nîne Zane ko sofî dîn e
Ê zane her mezin e Lê nezan tim li bin e.
Nûjen (Mihemed.E.Hiso), ji pirtûka wî Nafîn - 1998.

Rexne ji ramana civakê û prensîpên belavbûyî re barekî giran e, ne her helbestvan yan rewşenbîrek dikare hilgire. M.E.Hiso di vê helbestê de bi wêrekî û zîrekî berê xwe dide ramanên belavbûyî. Wêrekî di vekirina vê babetê de ye, zîrekî di awa û alavên wî de ye.

Ji destpêkê ve, navnîşan bi pendeke Kurdî berê xwe dide civakê, ango civakê bi wijdanê civakê rexne dike (Aqilê sivik barê giran e), tevî ev pend bi hezarê caran devokî hatiye gotin, helbestvanine din berê jî bi kar anîne, lê hîna bi kêrî helbestine nû tê, ji ber pend ji pêkhatên çanda her mirovekî ye û mafê afirandina wê bi tûkesî ve ne girêdayî ye.

Hevokê din nêzîkî pendê ye, ji zimanê rojane (Serî kevîr û hesin), lê diyar e ku helbestvan serhişkiya Kurdan li vir ne bi wateya ku ji ya xwe nayên xwar bi kar tîne, lê ew ji bêhişî û nezani serhişk e, ev rexneyeke tûj e. Paşê helbestvan dîmenê berçav dike (Her dibêje şêxê min, lê ew nayê bîra şêx), Peywerî, sofitî û aligirî, gelo ev ji Kurdan re xeyset û sinc e yan qeder û bextreşî ye, helbestvanê me ji bilî herduyan tişteke din di vê diyardeyê de dixwîne, dibîne ku peywerî nezani ye.

Nûjen weke rexneya xwe tûj, helwesteke sererast dide (Rabe serî bipelêx), seriyê ne bi xwe be, dibe bela xwediyê xwe, ji ber wê eger bipelêxê baştir e ku bimîne. Dîmena din li hember sofitî û mirîdiyê ne kêmi wê ye (Carna dibêje Sovyat, di hawara me de hat, haya Sovyat jê nîne), eger mirov peywer be bobelatek e, lê bobelata mezintir ku serî hay ji teriyê nebe, yan jî zane ew sofitî nezani ye (Zane ko sofî dîn e), yê nezan tim destik û alav e û herkes dizane ew nehêjayê guhdanê ye.

Piştî pend, prensîp ji mejiyê civakê, rexnekirina tûj û helwesta hişk, helbestvan li dawiyê pendê daferîne (Ê zane her mezin e, lê nezan tim li bin e), çî ji aliyê wateyê ve be, çî ji aliyê sazîrînê ve be, ev gotina dawî li gor pîverên pendan pendeke tekûz e, du rewşan dide ber hev û her peyvek di hevoka yekem deबरamberî yekê di hevoka duyem de hatiye: (ê-lê),(zane-nezan),(her-tim), (mezin e-li bin e). Li dawiyê dixwazim bêjim ku ji aliyê afrênerî ve helbest bi şeweyê nûjenkirinê hatiye, lê hemî wêneyên wê kevneşop in, hêjayî gotinê ye jî ku ew cureyê helbestan ji aliyê delamet û rola civakî dihatin nixandin.

Kûçikê Reş



Bi lez cilên xweyî kar ji xwe danî, hinek kapeka ji ber birrîna textan li dor guhê wî mabû, wextê di ber neynika ber deriyê werşê re meşiya, çavê wî lêket, bi lez vegeyria ber avê xwe bişo, wextê xwe daqûl kir, perê wî ên hesin ji bêrika wî şemîfîn û bi xwe re jî ê xaket avêtin nav avê. Bi qehir rahişt wan û bi lez derket bê ku li neynikê binere, Du seet mane wê deriyê geracê bê girtin, û tirimbêl namînin.

Li ber deryê malê kilîta xwe derxist, derî vekir kes li malê nemaye, îro daweta kurxalê wî ye, giş li dawetê ne, ewê jî bighê wan, perekên xweyî şil derxistin û dan ber tîndanê, cilê xwe dan ser hev û berê xwe da serşokê, tişteki tenê ew xistibû tayê de, gund 7ê KM durrî rê ye, hîna tîrsa kûçikê reş di dilê wî de ye, gelek caran delingê wî çirandiyê bi devlêkirinê xwe, li ber neynikê li seetê nerî, maye kêmi seetekê ku geracê bê girtin, berî ku deriyê xwe bigre, qorzika çakê wî di derî de rabû, hidikek jê çirand, başbû di cihekî ne xuyanê de ye -ji xwe re dibêje-.

Li ber deriyê geracê destê xwe avêt perên xwe, şilbûn gelek di wan de nemaye, tirimbêla dawî ye û ew jî siwarê dawî ye, xwe avêt tirimbêlê, yê kêleka wî dest danî ser çoga wî, ser çava Dilawer, derket hevaleyê wî, kir û nekîr zîlam kirya xwe û wî herdûka da. Berî bighê rastî gund dîsa kûçik

hat bîra wî -li vê derê min dax ji kerema xwe re- ji yê şifêr re dibêje. Hîna peya nebibû şewqa tirimbêlekê da çavê wî, ku merivîn wî ne ewê jî herin dawetê. Di dilê xwe de got: Ez ji kûçikê xelas bûm. Li pêşiya dawetê çav diya xwe ket, bi lez çû cem, xirad miradê di bêrika xwe de danê ji bo di dilanê de wî aciz nekin.

Hinek merivên wî xwediyên dawetê bixêrhatina wî kirin, û berê wî dane dilanê. Baş e ronîya dawetên gundan kêmi e, qetandina binê çakê tew xuya nake - ji xwe re dibêje.

Ji nişka ve çavên wî li keçka merva wî dikeve, dilê wî tê de heye lê ceger nekiriye tucarî jê re bêje. Govend carekê geriya, destek ji paş de destê wî vekir, li dû xwe nerî, ku ew keçik e.

Di belakirina şeraniyê de mixaletyek wî hat kêleka wî rûnişt, xwediyê kûçikê reş bû. Kêfa wî gelekî jê re nedihat. Got: Dilwer min berî sê roja deriyek nuh ji hêwana malê re siwar kiriye, dixwazim tu bê lê bînerî, bê textê derî baş e ya na. Serê xwe hejand û bersiv neda.

Di rê de bû behsa kûçikê reş, got: Mane peyaki bêbav kûçik bi demançe kuşt. Dilaewr di hundirê xwe de kenîya û xwe kir ku li ber kûçik ketiye.

Berî dawet bi dawî bibe, xelkên xwedî tirimbêlê jî bajêr hatibûn dawetê gotin: Ê bê tirimbêlê be, û bixwaze vegere mal, cî heye.

Bi lez Dilawer berê xwe da diya xwe û got: Ê min ez ê vegeim, divê sibe destê sibê li ser kar bim. Xalê wî Şemsiddîn destê xwe li piyê wî xist û got: Xwarzê sibe piştî firavîne ez ê diya te û zaroka bînim û bêm.

Di rê de gişî rû li ken bû, ne xasim kûçikê reş bar kiribû, û keçka jê hez dikir zêdeyî niv seetê bi hev re dîlan kiribûn.

Dema ghişt ber deriyê malê, seet bibû dora didwê şevê. Bêhnêkê sekinî, ma li dora xwe nerî, destê xwe avêt bêrika xwe ku kilîl ne tê de ye.

Halana Dil



Roj diçû ava...
Tariyê perda xweyî reş
Berdida ser riwê gerdûnê.
Gund...Û...Bajar...
Diketine xew
Heyvê şerm dikir
Piştî xwe dida te...
Û xatir nedixwest û diçû...
Stêr direvian...
Dilên evîndarên te xemgîn dikirin
Û ..
ew jî diçûn.
Amûdê.....keleha êş û xeman
Tu bi tenê şiyar dîma
Li ser masa derdên xwe...
Te şîva evîndarên xwe
Lehengên xwe ... Can fidayên
xwe...
Amade dikir û digel barçemokan,
Te guliyên helbesta xweyî
westiyayî dihûnand...
Landîka êşên te,
Evîndarên te, giyanên sotandî...
Lehengên te... Li asîman...Firîştî
dihengand
Pê re dikirin semaÛ
Dibin çengên xwe de binax kirin...
Amûdê...
Birçiyê helbestê me.
Bêriya zivistanê teyî bi şwînî
dikim...
Û fixanên bi axin li kolanên te...
Cadeyên teyî jîbîrkirî,
Tenûra nanê teyî germ sarbûyî,
Dastanên dîne teyî biaqil...
Hewar digot:
-Xwedê nehêle...
Wê ji kêre bihêle, ji kêre nehêle...

Şêxê Doda li gola Enter...
Mîrîdên xwe dicivandin, li erbanê
didan...
Şermola dihejandin...
Çîrokên binaxkirî vedijandin...
Ji xew şiyar dibûn.
Çîrokên.. çîrok ji hev re digotin...
Mindalên ku zû ji himbêza
dayikên xwe koçber bûn...
Bi refên çûkan re,
Bi firîştayan re...
Dojeh dixemilandin...
Qedera min bi a te ve girêdayî
ye...
Qedereke nepen...
Dara jiyane ji mêj ve...
pela te hilweşandiye.
Rewşa te awarte ye,
dayika min, evîna min....
Ta kengî di payîzê de, dibin pelên
hilweşiyayî de...
Bêdengiya xwe veşere.....
Li ser şêlakê.. herdem navê te..
dinivîsinim....
Lê pelên derya hiltîne...
Karwanê omîdê..
Te li pişt xwe dihêle.
Gerdêlêlê ..giyanê te dilerizand...
Tu germ î..sar nabî.....
Hevîrên xwe li tenûra te dixistin...
Te dipêça...
Li şoreşgêran belav dikir...
Şoreşa hebûnê..
Bi te berdewam dibû...
Şahrezad ..
Dilpakîya te bû...Toş..
Welatparêziya te bû...
Herifandina...
keleha zordariyê,
Awirek ji awirên tolê bû...
Ax, ax, ax... Amûdê...
Nema dikarim, li hêviya wê rojê
bimînim
Ez ê bimrim...
Giyanê min bi axa te şa bibe,
Min pir ji te hez kir ...
Amûdê.... Dayika min evîna
min...
Şehrezad: Navê sînema
Amûdê bû a ku di sala
1996'î de hate şewitandin û
bêtirî 28 zarokên kurd tê
de hatin şewitandin.

Qirûşan Ji Nav Tirafê Derînin

Bi lez defterên xwe pêçan, di nava kîsên naylonî de wenda kirin. Cilên ku ji mêj ve bihna xwîn û şewatê di wan de şîn hatibû bi ser bejna mehweşê de berdan.

Çavên ku xewnerojan di ber wan re - mîna balfirên zaroka ên kaxezi - baz didan, berî ku Nîron festival şewatê li dar bixe diçirisan din.

bê şiv û bi gavine piçûk, ku alîkarî di tariftiya şevê de bi wan re nedikir, kerwanê rewan-nazan xwe di ser golên ava ku li kolanên de belawela bûbû çeng dikirin...Ber bi govenda şewatê de diherikîn, ta ku milê xwe bidin milê mirinê û agirê serxwebûna Cezayirê hilor bikin.

Gef û fortên mamoste: « Ê ku pera neyne nigê wî nema derbas dibe dibistanê» sawîrin ji kolanên Amûdê tarîtir di mejiyê zarokan de şiyar dikirin, û dihişt ku bêagah dest li bîst û pênc qirûşên di bêrikên pînekirî de razayî ne bi hêz werin hev....

Pêlê kulîlkan li ber kuleka bilêtan lihev diketin, pêşbazî bi alî mirina ku konê reş li ser banê sînemê vedabû dikirin...Gurên dev bixwîn li ser ban di çeperên xwe de li hêviya nişana qêrîna zarokan xwe veda bûn.

Plana agirberdana daristanê berê hebû...! Wê êvarê agir di kolanên welatê şewatan de awaza sirûda mirinê saz dikir... Ne ji bo rêberiya berxikên ku di nava pêlên tarîtiyê de ji keriyê xwe mabûn, lêbelê ji bo wendakirina van berxikan di nava van pêlan de...! Agirê me yê Ji hezarên salan ve di dil, can, çav, bejin û sînga me



de gûr e, li hêviya vemrandina çirayên Amûdiyan, vegera bavay ji karên xwe, kenê ku ji lîvên pakîzan weşiyabû û lorikên dayikan nemabû...!

Zû bi zû agir çira xwe pêxistibû û bi lez ber bi koza « berxikên kesk » ve dimeşiya, di balgehên payîzê, porên zêrin, nanê tisî û pêlavên lastîkî de ew agir li rengê xwe digeriya.

Tembîniyên dayikan li ber lîngan çûn... zarokan birinên xwe di ser serê xwe re anîn û bi agir derman kirin, ma kengî pinpinik dikarin xwe ji agir biparêzin? Ta baran di nava agir de şewitî... Agirê xwe berda dilê helbestê, Mihemed bejna xwe li ya wî digirt.

Amûdê, wê şevê agirê xwe hembêz kir û zarokên xwe tî xistin xew...!

sibehê peryên zarokên xwe ji nav tirafê dida hev, û xwelî ji ser mijankên kizirî dadiweşand...!!



Ji ber ku ji bejna naroz tu kembera herî nazî
Çeqelan dor te pêç kirin li hevdû dikirin gazî
Hoy û çakî tewilandin mirov bezandin, pê tazî
Bi navê Xwedê digotin: Em in mîr û Em in qazî
Ji ber ku tu, bûka xwedan siwar û gerdana gazî
Çeteyan xwestin te bigrin bi gef û tirs û tolazî
Ji ber ku axa te sore xurû sade Kurdê, bazî
Hêviyên me şeridandin da cudakin gaz bi gazî
Digotin: Bê kes û yar e derbikin derd û tinazî
Kambax bikin bi top û tang kî bêje em bi xwe razî
Ji ber ku vîna te rok e ji mêj de tava bi sazî
Nîgar kirin zinara Kurd'se pîlan danîn bi zorbazî
Ji ber ku hebûna Kurda ne çû ava bi fêlbazî
Qirkirin bê rûmetiyê tefandin mûm û şanzazî
Wekî ewrên reşî tarî zuha û tev agirbazî
Xwe avêtin nav çavê te, ne saxin raman bawêzî
Ji ber ku pêdariye me li berê şer ser firazî
Şervan û pêşmergên çeleng bi hevdan sozê serbazî
Ji Xaneqîn û Şengalê ta Kobanî yek daxwazî
Deşt û geliyên Kurdistan mizgînî xweş bangewazî
Bersiva axê li jê re belgayan perû kir arzî
Mila em ê bidin hevdû cangorî xweş karesazî



Hembêza Gerim
Zahid Mehmûd

Adarok

Di riyên efsaneyên jîbîrbuyî re
Vaye bi çarîneke xakî re tîm...
Xwe bi destên şewqa çirayan
digrim,
Bi milê ken,
Ronî bi ronî,
Stêr bi stêr,
Roj bi roj
Xwe digihîjînim dergehê sînga
te.
Tevî bîna pelên gwîzê
Hatim bihingivim Adaroka çav
hişîn
Ya ku mîna neqşa çiniyekê
Xemilandiye ruyê dilê te...
Ez ê di şevêqa Newrozeke
çeleng de,
Berî zarok xwe li ser agir
biqevêzin,
Mîna pirpirîkekê,
hemî rozerînan hilgirim,
Werim ramûsana laşê Adarokê,
Bila, li ser pelkê wê yî cêwîka
xewnan
Her kêlî,
Her bîst û çar saetan
Wekî morîkek hişîn,
Wekî kevirêkî krîstal vêkevîm...
Ji bo ku,
Herdem,
Bejn û bala Adaroka me,
Bi xwîna xwe ya dîn
Av bidim...
Ji bo ku,
Temenê hemî kulîlkan
evîndaran,
Û emrê kenê çavên te dirêj



Fatma Savcî
bikim...
Dotmîr
Dotmîrek Bedîrxanî
stêreke xuricî me
ji çîroka Ciziryan.
Leylêkê mişextkirî
Zîneke baskîkestî me
di hembêza botaniyan de.
Di çemên ferad de
meyandîne hîna
herdû çavên min.
Di sînga min de
dikewin hîna
efsaneyên botanî
ku agîdên wan
koçberkirî ne.
Di evînan de
jîbîr bu bim jî
şahên babîsokan dihewînim
li xewnên wan.
Ji tîrsa digrim carna
dibê ku bo mirinê jî
welatek minî bask cebirî û
azad çenebe tucar...

Zanist û Kurd û Cizîrî

Berdana Jinê
Di Civak
Kurdî De



Destpêk

Mirovahî li gor pedivîyên xwe li ser şopa zanîne meşîye. Mirov ji bo ku razê gerdûnê keşf bike û ji bo ku jiyaneke hesan bibe her dem bi rêyên zanistî li çareserîyê gerîya ye. Di vê lêgerînê de ji mirova re tiştê herî alîkar bêguman zanist bi xwe bû. Lê bel dibe pêşî zanist werê naskirin. Bi gotîneke din dibe zanînen ku li ser rûyê erde hene werin sinifandin. Bêguman zanist jiyaneke hesan pêşkeşî mirovahiyê kiriyê. Gelo ji we zanînen û zanista ku dinyaya îro ya nûjen pêşketiye de Kurd li ku derê ne? An Kurd di nav zanistê de cihêkî çawa digrin? Gelo Kurd li zanistê xwedî derketine? Di vê nivîsê de em ê bikevin pêşî şopa zanist û zanista Kurdî.

Zanist

Zanist ji koka zanîne tê. An ku bingeha zanistê zanîne. Zanînen, agahdarîbûna her tiştî ye. Heçî zanist e bi taybet zanîna ku hatîye tecrûbekirin e. Bi gotîneke din bi awayekî ku ji hêla kesên pîspor ve li gor hin kanûna ve diyarkirina agahiya ne. Zanist kêmasî û pêdiviyên mirovan bicîh tîne. Ku îro dema em dibêjin zanist, tiştên nojdarî, fizîkê, kîmyayê, û teknolojiyê tê bîra mirov.

Zanist ji nav Kurdan jî derketîye lê ne bi zimanê Kurdî û ne li ser navê Kurdan.
"Şaristaniya Yewnan, şaristaniyeke Kurdên ku koçî Yewnanê kirine ava kirine. ... Çavkanîya şaristaniya Yewnan Kurd in".

Dabeşkirina Zanîne / Zanistê
Ji demen kevin ve heta îro gelek zanayan û rewşenbîran zanist dabeşî kirine. Her kesekî li gor zanînen û ramanên xwe zanist ji hev cûda kirine an ku kategorize kirine. Bi gelemperî zanist wek du beşên sereke tê beşkirin.

-1 Zanîstên Civakî: Ol, edebiyat, dîrok, erdnîgarî, felsefe, ...

-2 Zanîstên Pozîtîf: Fizîk, biyoloji, n, kîmya, elektronîk, ... Di vir de mijara me zanîstên pozîtîfîn. Dema me zanist nivîsî armanca me zanîstên pozîtîf in.

Zanist û Kurd

Wek rastîyêke jiyane ye ku zanist li deverên ku mirov azad be tê avakirin. Li deverên ku ramanên mirovan ne azad be pêşketinên zanistî ne mimkûn e ku çêbibin. Naxwe em dikarin pêşketinên zanistî bi desthilatdariyê ve girebidin. Wek mînak dema îro em li welatên ku ji hêla zanîstê ve pêşketî ne dinerin bêguman ji hêla azadiyê ve jî pêşketî ne. Naxwe ev rewş di her demê mirovahiyê de rastîyêke jiyane ye.

Ji roja ku dîroka mirovahiyê hatîne nivîsandin heta roja me Kurd bi awayekî rêk û pêk nebûne desthilatdar. Evna jî encama nebûna zanîstan dibe. Desthilatdarî hêzeke mezin dide pêşketinên zanistî. Lê bele, gelo zanist ji nav Kurdan derketîye? Wek bersiv em dikarin bi dilekî rihet bibejin ku zanist ji nav Kurdan jî derketîye lê ne bi zimanê Kurdî û ne li ser navê Kurdan. Wek tê zanînen ku bi sedan zaneyên Kurd hene û bi hezaran berhem û lêkolîn derxistine meydanê. Lê mixabin bi bandora desthilatdariyê

berhem bi zimanê desthilatdar in. Ku li gor demê xwe an Erebi an Farisî bûn. Di vir de ev pirs derdikeve hemberê me. Gelo kesê ku tiştêkî zanistî pêşkeş kiribe, Kurdbûna wî bes e? Mesele zimanê berhemê ne girîng e gelo? An her kesê ku li ser axa Kurdistanê hatîye dinyê dibe Kurd be? Ev pirs yek dikare zêde bike. Lê belê em vegeirin mijara xwe.

Dîroka zanista Kurdî em dikarin wek sê serdema bibehîkin:

-1 **Serdema Antîk:** Ev serdem ji roja ku şaristanî ava bûne heta ku Kurd ketine bin fermandariya Îslamê berdeham kiriyê. Ji vê serdema bi taybetî zanîstên dibin siya efsaneyan de hene ku bidevî an ji lêkolînên nivîskî hatîne berhevkerin. Di vir de gotina herî ku ji bo Kurda xweş tê bêguman ya Elî Şerîatî ye. Elî Şerîatî di pirtûka xwe ya bi navê Dîroka Îslam û Zanist û Şaristaniyê de "Şaristaniya Yewnan, şaristaniyeke Kurdên ku koçî Yewnanê kirine ava kirine. ... Çavkanîya şaristaniya Yewnan Kurd in".

-2 **Serdema Klasîk:** Ji destpêka fermandariya Îslamê destpê dîke heta sedsala 19'an didome. Di vê serdemê de bi saya medreseyan xwendin û nivîsandin di nav Kurdan de belav bû. Di vê serdemê de bi teşwîkkirina dîne Îslamê zanayên medresa li ser mijarên zanistî rawestiyane. Ev rewş encama pêşketina zanistê dide. Lê mixabin xebatên zanistî ku mabesta me zanîstên pozîtîf in gelekî kem in. Tenê xebatên El-Cizîrî hene.

-3 **Serdema Modern:** Ji sedsala

19'an destpê dîke heta roja me didome. Mixabin di vê serdemê de jî ti xebatên li ber çav nîn in. Di vir de sedema herî girîng tînebûna desthilatdariyêke Kurdan e. Kurd, di sedsala 20'an û serê sedsala 21'an de bi taybetî ji karê siyasê daketin.

El-Cizîrî

Navê wî yê rast Bedûzzaman Ebûl-îz Îsmail kurê Rezzaz e. Navê bavê wî Rezzaz e. Nasnavê wî El-Cizîrî ye. Li Rojava bi navê Cazarî an Gazarî tê naskirin. Di navbera salên 1102 û 1133'yan de jiyaye. Li medreseyan Kurdistanê perwerdehiya xwe qedandiyê û li heman dem li van medreseyan ders daye. Ku ev medrese medreseyan Cizîrê û Diyarbekirê ne. Îro di nav zanîstên dinyayê de wek bavê sibernetîke tê qebûlkerin. Wek di neqqaşekî zîrek, endazyarekî pêşketî, fizîkvanekî jêhatî, û hostayê maşîmayê. Navê pirtûka wî ya bi navê deng El Camî û Beynel İlmî Wel Amel, En Nafî û Fis-senaetîl Hîyel e. Bi kurtasî wek el-Hîyel tê naskirin. 16 kopyayê ve berhemê li muzeyên cûda yê dinyê de tê parastin. 9 ji wan kopyaya li muzeyên Tirkî ne. El-Cizîrî heta sala 1114'an li Cizîrê dimîne. Ji ber sedemên siyasî derbasî Diyarbekirê dibe. Li vir li qesra Artûkiyan de ew berhema xweyî hêja dinivîsîne. Dawiya temenê xwe vedigere Cizîrê û li vir dimire. Îro gora wî li bajarê Cizîrê ye.

Bele piştî van agahiyan em werin ser cîherengîya el-Cizîrî. El-Cizîrî bi xebatên xwe wek serkêşe şaristaniya îro tê qebûlkerin. Ku şaristanî bi sibernetîkê pêş de çûye. Îro di

her tiştê elektronîk û otomatîk de bandora el-Cizîrî heye. Dinya alem li ser xebatên el-Cizîrî lêkolîna dîke lê mixabin mirovekî bi vî rengî hêja dinav Kurdan de naye naskirin. El-Hîyel di gelek kovarê zanistî de cîhîrtî ye. Li zanîngehan li serê xebatên akademîk tê ne çêkirin. El-Hîyel heta niha wergerandine zimanên Tirkî, Înglîzî, Elmanî, Fransevî. Zimanê berhemê yê orjînal erebî ye.

Encam

Wek di vê kurtelêkolîne de hat dîtin berî hezar salî Kurd bi zanistê re tekildar bûne. Le ji hingî heta niha ti xebatên li ber çav nehatine kirin. Belê, çima gele Kurd mirovekî ewqas binavûdeng nasnake? Em zaneyên biyanî baş nasdikin. Li ser wan xebatan dikin. Lê heya me ji zaneyên me nîne. Sedem çibe gelo? An wek bav û papîrên gelo "geyayê hewşê tahl e". Em li el-Cizîrî xwedî derneketin lê Tirk û Erebi ew ji xwe hesabandin. Di vê nivîsê de me xwes bi çend pîrsa bala mirovên Kurd bikşênin ser lêkolînên zanistî ku mabesta me zanîstên pozîtîf in. Wek armancake duyem ji me xwe Kurd El-Cizîrî nas bikin û lê xwedî derkevin.

Çavkanî:

-1 Yaşın, Abdullah. "Cizreli İsmail Ebul-İz" Kent Y.

-2 İşık, İbrahim. "A'dan Z'ye Kürtler" Weş. Nûbihar

-3 Çağlayan, Mehmet. "Şark Uleması" Çağlayan Y.

-4 Nasr, Hüseyin. "İslam ve Bilim", İnsan Y.

Mêrdîn, 2014 - Dilazad A.R.T. dilazadart@gmail.com



Ferhan x. Keleş

Berdan ew e; ku di malbatekê de mîr bibe hevjinê xwe min tu berdayî sê cara, lê du beşê berdanê hene yek bi vegera dema kêmi sê caran gotibe min tu berdayî, beşê di bevegere, û ta lêveger çêbibe pêwîst e ew hevjin bi kesek din re bi peymanek rewa bizewice. Bandora berdanê li ser malbatê mezin e, ya ku ew e bi taybet bingeha civakê û bê wê civak aloz dibe.

Di vê babetê de û di biryara berdanê de bav jî di civakê diêşe, dema bixwaze jineke din bîne divê yeke berdayî û temen mezin bigere, û dema tîne bê şahî derbas dîke (gelek ji wan) ji ber gelek bandora derûnî a neyînî lê dibe, û wekî di jî ew dîrî çavê civakê dizewice.

Ji aliyekî di ve ger sedem ne ew be jî, jin bi berdana xwe kêmi dibe, û guneh tev dikeve ser piyên wê de, dîrî zarokê xwe dikeve û gelek hene malbata wan wa xwedî nake, û wisa dimînin ber devê dergîhê xelkê û her di bin çavê gûmana civakê de dijîn, dema ev jin nikaribe kar bike û di aliyê masayî de mafê wê bê xwarin gelek jiyana wê zor dibe, lê hêja yî gotinê ku ziyane berdanê li ser zaroka ku rengê pêşeroja civakê bi wan destpê dîke gelek dijwar in.

Ji vê yekê berevaniya malbatê ji erkê civakê tevî ye.

Derçûna Xuleya Şagirtên Akadîmiya Mezobotamiya



Li navenda Akadîmiya Mezobotamiya ya maf û dada civakî (26) şagirt ji keç û xortan derçûn, aheng bi bêhnêkê bê deng li ser canê pakrewanan destpê kir, tê de de gelek gotin hatin pêşkêşkirin û tê de pêwîstiya jiyaneke azad hat tekezîkirin, herwiha behsa bîndestîya ku ji me jê ve li ser kurdan hatîye, û armanca vekirina wê navendê ku parastina nexerên civakî ye. Di dawî de bawername li ser şagirtên serkeftî bûn hatin belavkirin ta ku karibin li dadgehên gel karê xwe yê fermî bikin.

.Li Bajarê Heskê Bawernameyên Derçûnê Hatin Belavkirin



Li navenda Cegerxwîn a Partiya Pêşverû ya Kurdî li Sûriyê Ahengek bi boneya bidawîbûna korsa Zimanê Kurdî, dermankirina nexweşan, dirûtin û kiwafertiyê hat lidarxistin, û tê de gelek cemarawer amade bûn, navenda Celadet Bedirxan û navenda Ferhad Çelebî çavdêrî li ser karê ku li ser wê korsê dikirin.

Di ahengê de hunermend Me'sûm Şikakî û Fêsel İbrahim bi awaz û stranên ahengê xemilandin, û pê re jî helbestvanê gewre Salihê Heydo bi çend helbestên xweş li gel helbestvan Azad Osê gotin û dilê şagirtan geş kirin. Di dawîya ahengê de bawernameyên derçûnê li ser hemû şagirtên beşdarî wê korsa mezin û fireh bûyî hatin belavkirin.

Keda Salekî Bi Serkeftin Derbas Bû



Di 12, 13, 2014'an de li taxa Meyselûn Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Sûriyê (Komîta Nefel), ya biser partiya (PYDKS), Wehdê ve diçe, bi boneya salekî ji hîn û fêrkirina zimanê Kurdî bo şagirtan ahengek lidar xist. Aheng bi xuleyêkê bê deng li ser giyanê pakrewanê Kurd û şoreşa Sûriyê hat rawestandin, paşê gotina komîta Nefel a Saziya Ziman hat xwendin, û di gotina xwe de diyar kirin ku ewan di qonaxa wê salê de 11 şagirt fêrî Elfebîya Kurdî kirin û 9 jî fêrî rêzimanê Kurdî bûn. Gotin û helbest jî di wê ahengê de hatin xwendin ji wan: Gotina şagirtan, gotina Yekîtiya Nivîskarê Kurd, Bavê Saman helbest, Dilbîrîn helbest. di dawiyê de mamoste Mistefa Meşayîx Cîgirê Serokê Partiya (PYDKS), Wehdê, axeftinek kir, tê de pirozbahiya şagirtan kir û spasiya komîta Nefel li ser vî karê mezin û hêja yê di qonaxa salekî de hat kirin kir.



Hefiyek Taybet Bo Belavkirina Çanda Mafê Mirovan



Li navenda Mihemed Şêxo û bi helkefta roja Mafê Mirovan, rêxistina Mafê Mirovan û rêxistina Jina Azad li Rojava ragihandin ku ew ê heftiyêke taybet ji bo wê rojê lidar bixin.

Ahengê bi demke bê deng li ser giyanê pakrewanê Kurd û Kurdistanê rawestiyane, pişt re berpîrsê rêxistinê gotinê xwe xwendin, tê de behsa karê xwe ku di wê heftiyê taybet de bikin kirin, û li gor pirograma wan ew ê hewl bidin ku çanda mafê mirov belav bikin, dengê xwe û raporê xwe bigihînin rêxistinên navdewletî yê mafê mirovan, di wan raporên de divê ku em her tiştî tê de eşkere û rewn bikin nexasim kujtarên rêxistina Da'îş yê li ser gelê Kurd li Şengal û Kobanî..

Navenda Biratî li Qamişlo Berevanên Di Ber Mafê Mirovan De Xelat Kirin



Navenda Biratî bo Demokrasî û Civaka Sivîl li hola Nûbela û bi helkeftina roja cihanî ji bo mafên mirovan ahengek lidar xist û tê de berevanên di ber mafê mirovan de xelat kirin. Ahengê bi xwendina rapora ragihandina cihanî ya mafên mirovan destpê kir, pişt re filmek hate pêşkêş kirin, herwiha behsa hemleta xwe ya bi navê "Mafên te ne minet e", kirin paşê navnedê ragihand ku ew ê di wê ahengê de çalakvan û berevanên di ber mafê mirov de wê xelat bikin û yê hatin xelat kirin ev bûn: Parêzer Ebdulselam Ehmed, parêzer Mehmûd Omer û mafnas Sebrî Resûl. û di dawîya wê ahengê de mêvan hatin vexwendin ji bo ew mûman vîxîn bi helkeftina wê roja mafnasî.

الهند تعتقل رجلا بسبب تغريدات مؤيدة لداعش



وقال مفوض الشرطة إم. إن. ريدي للصحفيين "كان مقربا على وجه الخصوص من الإرهابيين الذين يتحدثون الإنجليزية من تنظيم الدولة وأصبح مصدرا للتحرير والمعلومات للمجندين الجدد الذين يحاولون الانضمام للتنظيم." وأقامت الشرطة دعوى ضده لتحرير على الحرب ضد الدولة، لكن والده قال لقناة تايمز ناو إن ابنه بريء وإن التهمة لفتت له.

ويوجد في الهند ثالث أكبر تجمع للمسلمين في العالم، لكن الشرطة تقول إن أربعة رجال فقط هم المعروف أنهم سافروا إلى الشرق الأوسط للانضمام للدولة الإسلامية. وعاد أحدهم منذ ذلك الحين واحتجزته الشرطة.

اعتقلت الشرطة الهندية السبت مسؤولا تنفيذيا في شركة يشتبه أنه يدير حسابا مؤيدا لتنظيم الدولة على موقع تويتر ينشر تطورات حملة التنظيم المتشدد العسكرية من مقره ببغالور.

وجاء اعتقال مهدي مسرور بيسواس من منزله بعد أيام من تقرير القناة الرابعة البريطانية الذي وصفته بأنه المسؤول عن حساب "شاميوينتنس" على موقع تويتر الذي يتابعه آلاف الأشخاص بينهم معظم المقاتلين الأجانب الذين ينتمون لتنظيم الدولة.

وقالت الشرطة إن الرجل البالغ من العمر ٢٤ عاما كان يرسل تغريدات على موقع تويتر بعد ساعات العمل يهله فيها لمكاسب "داعش"، ويسخر من أعدائها.

المسكوف، أسلوب مميز لطبخ السمك الطازج



المسكوف هو مصطلح يطلق على طريقة مبتكرة و مميزة لشي الأسماك مباشرة بعد اصطيادها يتميز بها التراث العراقي في مدينة بغداد حيث توجد نار دائرية الشكل و توضع أوتاد على حافة النار لتثبيت الأسماك عليها و بذلك يتم طهي السمك بطريقة الإشعاع لأن السمك يكون بعيدا نسبيا عن النار مما يكسبه طعما شهيا و في النهاية توضع السمكات المطهية على الجمر ليتخذ جلداه المزيد من الاحمرار. في مدينة بغداد، والتي يقطعها نهر دجلة، تنتشر المطاعم التي تقدم هذه الأكلة و معظمها يقع في شارع "أبو نواس" وسمي على اسم شاعر مشهور من بلاد الرافدين توفي في بغداد سنة ١٩٨ للهجرة، وله تمثال في نفس الشارع.

أعلن علماء آثار اكتشاف قرية يعتقد أن عمرها نحو ١٣٠٠ سنة بولاية أريزونا الأميركية



وتضم القرية أكثر من ٥٠ منزلا جدرانها مصنوعة من الحجر الرملي في منتزه قومي أميركي في شمال شرق ولاية أريزونا الأميركية.

وقام بهذا الكشف فريق كان يقوم بمسح جزء من منتزه الحديقة المتحجرة خلال الصيف، ويقول إن المنازل والتحف الأخرى التي اكتشفت في الموقع يعود عمرها إلى حد كبير إلى ما بين ٢٠٠ بعد الميلاد و ٧٠٠ بعد الميلاد.

وقالت أمي شوت وهي عالمة آثار تعمل في المنتزه، إن "الخزف الموجود في الموقع يوضح لنا أن ما عثرنا عليه يقع خلال تلك الفترة."

وعثر المساحون على أول أثر لما يتراوح بين نحو ٥٠ و ٧٥ من "المنازل الأثرية" مدفونة في كثبان رملية في المنتزه في يونيو، وقدروا أن القرية كان يقطنها نحو ١٢٥ شخصا.

وقالت شوت، إن من المعتقد أن تلك المنازل كانت مسكونة خلال ما يسمى بفترة صناعات السلال، عندما بدأت مجتمعات السكان الأميركيين الأصليين في المنطقة في زراعة محاصيل من أجل الطعام وإقامة ترقى.

وقالت إنه إلى جانب الأواني الفخارية الأثرية عثر الباحثون أيضا على أدوات بدائية مصنوعة من الحجر والخشب المتحجر بالإضافة إلى قلادات مصنوعة من الصدف.

وأضافت إنه لم يعثر على أية بقايا بشرية

برازيلي يقتل ٤٠ شخصا للمتعة.. ولا يندم



ماشى كوم/ اعترف رجل برازيلي يدعى سايلسون جوزيه داس غارسيا أمام الصحفيين بقتله لأكثر من ٤٠ شخصا على مدار ٩ أعوام، بدافع المتعة.

وصفت الشرطة سايلسون البالغ من العمر ٢٦ عاما، والذي أُلقت القبض عليه الأربعاء، بأنه "مضطرب عقليا"، بعد أن اعترف بقتله لهؤلاء الأشخاص بغرض الاستمتاع، مؤكدا أنه كان يفضل قتل النساء البيض خنقا، وفقاً لما ذكره موقع "سكاي نيوز".

وبحسب بيان الشرطة ريو دي جانيرو، التي أُلقت القبض عليه في المدينة، فإن اختيار الضحايا وكيفية قتلهم كان يتم بدقة كبيرة حيث كان يراقبهم لأشهر قبل قتلهم، ويحرص شديد على عدم ترك أي دليل يوحي بهويته.

وسمحت القوات البرازيلية للشباب بالتحدث

للمشركة. وقد تلقت هدية باهظة الثمن، من إبراهيم سنجاري صاحب شركة (راست) في زاخو. الهدية عبارة عن شقة مفروشة من اضعف وأكبر الشقق في كردستان، والتي يفوق ثمنها المبلغ الذي تهديه قناة الـ (MBC) للفتايزين بلقب برنامج (Arab Idol) الذي شارك فيه الكوفي بموسمه الثالث، وخرج في نصف النهائي. كان عمار قد حظي باستقبال حافل فور وصوله مطار أربيل الدولي، واستقبله عدد كبير من محبيه.

يُذكر أن لقب برنامج (Arab Idol) لهذا العام فاز به السوري حازم شريف.



أقدم زوجين في العالم يحتفلون بعد ٩٠ سنة من الزواج



في العالم، وأنهما تزوجا منذ ٨٩ عاما في كانون أول / ديسمبر عام ١٩٢٥ في الهند، مشيرين إلى أنهما مخطوبان للاستمرار كل هذا الوقت، "ولكننا مستعدان للذهاب عندما يحين الوقت"، وفقا لصحيفة "ديلي ميل" البريطانية.

وقال تشاند، الذي لديه ٧ أبناء و ٢٧ حفيدا والكثير من أبناء الأحفاد، إن سر الصحة والحياة الطويلة هو الابتعاد عن اللحم، وتناول الأطعمة الطبيعية باعتدال، والبحث دائما عن الأمور، التي تجلب السعادة لك ولمن حولك.

احتفل زوجان بريطانيان، الأحد الماضي، بأعياد ميلادهما، التي تصادف في نفس اليوم، بعد ما يقرب من ٩٠ سنة من الزواج، ويعتقد أنهما أقدم زوجين في العالم.

واحتفل كرم تشاند بعيد ميلاده بعد بلوغه ١٠٩ أعوام، بينما بلغت زوجته كارتاري ١٠٢ عاما في نفس اليوم، وذلك بعد ما يقرب من ٩٠ عاما من الزواج، مع أربعة أجيال من عائلتهما في منزلهما في مدينة برادفورد بغرب مقاطعة يوركشاير البريطانية.

ويدعي تشاند وزوجته أنهما أقدم زوجين

الكوفي يكشف أسباب خروجه من أرب آيدل وهديته تفوق المبلغ الذي تهديه قناة الـ MBC



كشفت المطرب الكردي عمار الكوفي، المشترك في برنامج «أرب آيدل»، أن إصراره على أداء أغنية للشركة كان السبب الأساسي في خروجه وإنهاء حلمه في البرنامج.

وقد أكد عمار أن خلافاً قد اندلع بينه وبين الإدارة، بعد أن أبدى رغبته بأداء هذه الأغنية الكردية، إلا أنه لم يكتفِ لهذا الأمر ورأى أن أداءه لهذا الموال كان أهم من الفوز.. وقال: إنه كان يعلم بأمر خروجه بنسبة ٧٠٪، حيث نيهت عليه إدارة البرنامج بعدم غناء أغنية للشركة باللهجة الكردية، بعد علمهم بنيتها غنائها، إلا أنه أصر على غنائها، مؤكداً أنه خرج من البرنامج بسبب غنائها موالا

زيت الخروع لعلاج الصلع



الزيتون ونصف حبة ليمون (حامض)، وذلك بالخليط الشعر جيدا، ثم اغسل الشعر بعد نصف ساعة.

* لعلاج التقصف ينبغي تدليك الشعر بزيت الخروع جيدا ليتم امتصاصه حتى يتحقق التنعيم. اخلط زيت الخروع مع زيت الزيتون، وقسم الشعر إلى أقسام، وقم بتدليك كل قسم جيدا.

* لزيادة نمو الشعر والسيطرة على تساقطه والحد من الصلع ينبغي مزج زيت الخروع مع زيت اللوز، لتسريع الدورة الدموية. ينبغي ترك الخليط على الشعر خلال الليل بعد تدليك الشعر وفروة الرأس جيدا.

* لتطبيب الشعر بزيت الخروع ينبغي تدليك الشعر به قبل استخدام الشامبو بـ ١٥ دقيقة. تتحقق فوائد كثيرة للشعر باستخدام زيت الخروع كمرطب. يمكن أيضا استخدام هلام الصبار والعسل وعصير الليمون مع الزيت.

خندان - زيت الخروع أحد المكونات الطبيعية التي تستخدم كثيرا في مستحضرات التجميل لخصائصه المضادة للالتهاب والبكتريا، وتقيد دراسات عديدة بأهميته في علاج مشاكل فروة الرأس مثل ترقق الشعر، وجفافه، وتساقطه، وتقصفه. يحتوي زيت الخروع على فيتامين "اي" ومجموعة من المعادن والمغذيات والأحماض الأمينية التي تزيد نمو الشعر.

فوائد زيت الخروع:

* يزيد نمو الشعر بسبب المغذيات والأحماض الأمينية التي تسرع الدورة الدموية في فروة الرأس وتغذي جذور الشعر. يمكنك خلط زيت الخروع مع قليل من زيت جوز الهند في وعاء وتدليك فروة الرأس به في المساء قبل النوم، وغسل الشعر في الصباح.

* علاج التهابات فروة الرأس والقشرة والحكة. لعلاج هذه المشاكل اخلط ملعقة كبيرة من زيت الخروع مع قليل من زيت

صحيفة Buyerpress تطلب من المكاتب التالية:

- قامشلو: مكتبة الحرية.
 - عامودا: مكتبة الثقافة - هجر كنرش - هاتف ٧٣١٥٧٠
 - تريبه سبيه: مكتبة الجهاد - هاتف ٤٧٠٨١٦
 - جل آغا: مكتبة السيد - هاتف ٧٥٥٠٦٨
 - ديريك: مكتبة ريزان - هاتف ٧٥٨٤٩٤
 - الحسكة: مكتبة الصالحية - هاتف ٣١٨٢٣١
- مطلوب موزعين معتمدين في كافة أنحاء المحافظة.
- للاشتراك الشهري بأعداد الصحيفة: يمكنكم الاشتراك عبر تلك المكاتب، أو عن طريق المركز الرئيسي: قامشلو هـ - ٤٣٦٦٠